

03

Rovî Çû Xwazgînî

Çirokeka folklorî



www.araratgroup.info





Yek ji projeyê Ararat Groupê ye.

Birêveberîya projeyê:

Silêman Osman - Raman Hesê

Edîtor û sererastker:

Ara Zarok

Nîgar:

Nêçîrvan Ehmed

Dîzayin û amadekarî:

Mihemed Osman

Hesan Mihemed

Şînda Ekrem

Cûdî Elî



Weşanxaneya Şîlîrê, Qamişlo

weshanashiler@gmail.com

www.shlier.info

Çapa yekê
Qamişlo 2022'ê

Çapxaneya şehîd Herekol, Dêrik



+963 989 966 863



@arazarok.online



Ara Zarok



@arazarok_online



@arazarok.online



zarok@arasat.online

©Hemû maf parastî ne.

www.arasat.online/zarok



Hebû, tîne bû.

Şîvanek hebû navê wî Zoro bû. Zoro pezê xwe biribû şkeftê.
Çend roj derbas bûn, dît ku Rovîyek bi ser da hat.
Zoro dengê xwe nekir û Rovî li şkeftê hewand.

Zoroyê Şîvan jî xwe ra ci xwarin çê bikira; nan ba, goşt ba,
wî û Rovî pev ra dixwarin.

Rovî her tim şkeft berdida û diçû jî xwe ra digeriya.





2



Carekê Rovî rastî Gurekî hat, rabû ji Gur ra got: "Birayê Gur!"

Gur got: "Çi ye?!"

Rovî gotê: "Rabe ser xwe, rabe! Maleka birayê min heye, ma ew qasî xweş e. Cihekê germ û nerim e, birayê min xwarinê ji min ra çê dike, nan dide min, goşt dide, ez têra xwe xwarinê dixwim, xwe dirêj dikim, radizêm. Bilezîne rabe em herin."

Rojekê Şivan tê, pezê xwe diajo şkeftê, dînihêre ku çi bibîne, va ye Gurek hatiye xwe li şkeftê vezîlandiye.

Şivan dibêje: "Welah hebe nebe, ev karê Rovîyê fêlbaş e!

Rovî çûye û ew aniye vê derê!"

Zorouyê Şivan rebeno dengê xwe nake.



Gur û rovî her roj şkeft berdidan û ji xwe ra diçûn gerê.

Hinekî dimeşin; rastî Hirçê têñ, ji Hirçê ra dîbêjin: "Hirçê! Çîma tu li cihêñ sar dimînî, ma ne heyfa te! Birayekê me heye em êvarê diçin cem, nan dide me, qelîyê dide me, cihê wî xweş e, em ji xwe ra diçin li cihê wî yê germ radizên. Tu jî were!"

Şivan vedigere şkefta xwe dînihêre ku wa Hirçek jî lê bûye bela!

Şivan dîbêje: "Hebe nebe Rovî Hirç aniye vê derê."

Dîsa dengê xwe nake.







Gur, Rovî û Hsirç; her roj şkeft berdidan û diçûn ji xwe ra digerian.

Li bayê meşê; rastî Kûçkekî têن, jê ra dibêjin: "Birayê Kûçik! Çima wisa bi tenê digerî, zikekê têر, yekê birçî?"

Kûçik dibêje: "Ma ka ez ci bikim lo! Ji dest min der ketîye û min nekiriye!?"





Dibêjin: "Ê me bixwe birayekê me heye, him nan dide me, him jî cihê germ, tu jî were em herin cem wî."

Kûçîk dibêje: "Xweş! Ma ci jê çêtir heye, hema ez ê jî bêm!"

Weke her êvarê; Şivan vedigire, dînihêre, ku va Kûçîkek jî xwe li şkeftê dirêj kiriye.

Dibêje: "Wê dawîyê ev Rovî belayekê bîne serê min."

Radibe rebeno goştê wan datîne ber wan û jî xwe ra radikeve.

Pênc şeş rojan bi vî halî li cem Şîvên dimînin.

Rovî jî hevalên xwe ra dibêje: "Birano! Kuro lawo; em nanê vî mirovî dixwin û qelenê wî tîne ye ku şû bibe (bizewice).

Divê em birayê xwe bizewicînin."





10



Dibêjin: "Xwezî! Lê ka em çawa wî bizewicînin?"

Rovî dibêje: "Hûn dizanin em ê ci bikin! Defa kekê Osê li odaya wî ye. em ê herin alîyekê odaya wî biqelêşin, qulekê çê bikin, hûn jî pişta min bigirin, ez ê di kuna dîwêr ra bikevim odayê û def û zirneyê der bixim. Heke ku me karîbû em der bixin, bila Gur rahêje defê û lê bide û Hirç jî li zirnê bixe, jîxwe ez ê jî li ber def û zirnê dîlanê bigerînim, Kûçik jî bila bide helehel û bilîlîne.

Ku me def û zirne der xist, em ê herin jora girê gund, em ê li def û zirnê bixin; ku me li def û zirnê xist wê qîz, bûk û xelkên gund bêñ li me binihêrin û dîlanê bigerînin, sema bikin.

Ez ê jî wan bixapînim û xwe bikim ku wa ye ez jî li ber wan dîlanê dîkim û serkêş im. Îcar çaxê ku ew bêñ, hema bila Gur bîlez rahêje qîzekê ji wan biavêje ser milê xwe û birevîne, em ê jî bidin dû wî û pê ra vejerin."





Rovî û hevalên xwe tiştên ku gotin kirin; def û zirne ji qula dîwêr der xistin û berê xwe dan jora girê gund.

**Hirçê li zirnê xist, Gur li defê xist, Rovî li ber dîlan gerand,
Kûçik jî kire lîlelîl û helehel.**

Qîz, bûk û hemû jinêñ gund hatin ji xwe ra binihêrin.







Hema ji nişkan ve Gur qîzek hilda ser pîyê xwe û revand.
Gundî revînê; negîhanê, pey ketin, bi vir da, bi wir da, negîhan wî!

Qîz anîn, hatin derbasî şkefta xwe û Zoroyê Şivên kirin.

Êvarê Şivan vegeriya şkefta xwe, dît ku Qîzek li wir e, got:
"Hebe nebe Rovîyê netebitî ev Qîza reben anîye şkeftê."

Şivan kulavek ji Qîzikê ra anî û raxist, nan û firavîna xwe anî, nanê xwe
pev ra xwarin lê Qîzikê nexwar.

Qîzik girîya û got: "Gur ez revandime, anîme vir û ez jî tirsiyame!"





Rabû Zoro li ber dilê wê çû û hat, ji xwe û Qîzê ra kavirek ser jê kir û xwarin, têr bûn, goştê xwe yê mayî ji ber destan rakir û veşart.

Rovîyê bênefîs xwe negirt, rabû çû goştê veşartî xwar.

Şivan şivek anî û yek li Rovî xist.
Rovî vezîliya û got: "Axxx pişta min!"







Piştî bêhinekê Rovî got: "Divê em dev ji birayê xwe berdin û jê cihê bibin.
Çi bira! Birayê ku ji bo piçek goşt li min xist!"

Êvarê Rovî ji xew rabû, çaroxên wî xwarin, defa xwe bi dizî û hêdîka ji hundir
der xist û vege riya xwe kire dî xew da.

Sibehê dema Şivan ji xew şîyar bû, li çaroxên xwe geriya ku li pêyê xwe bike;
wey! Tine ne, ew nedîtin!
Li vî alî geriya, tine! Li wî alî geriya, tine.

Şivan rahişte şiva xwe, hilda û li kêleka Rovî xist.
Rovî, Gur û Hirçê gelekî jê xeyidîn û rabûn ji şkeftê der ketin.





Rovî berê xwe da Gur û Hirçê û got: "Birayê Gur, xwişka Hirçê!
Hûn dizanin ci qas ji we hez dîkim, hûn li ber dilê min gelekî hêja ne û ez
dizanim hûn jî ya min nadîn bi dînyayê, lê we bi çavêr serê xwe dît ku wî
Şivanê qaşo me je ra digot bira, çawa bi şiva darîn li min da û şingînîya wê
her kesî bihîst!

Para me ji sewalên wî heft pez in, gerek e em heft pezên birayêñ xwe bixwin
û bi dû ra divê em jê cihê bibin."



Sibehê zû her sê rabûn ser xwe, ketine nêv kerîyê pêz; heyâ Şivan bi wan hesiya, her heft pezên xwe xwaribûn.

Şivan rabû berda Gur, Hirç û Rovî, lê Kûçik li cem xwe hişt!



ARA ZAROK

Çêja jîyîna zarokêñ Kurdan e!

